Rola Kurdpa ya salekê di şoreşa Jîna de
»»» R:7

KURDPA



Yekdengî remza serketvinê ye
»»» R:2



Şoreş bi pêşengiya jinan
»»» R:3



Şerê Dêrezorê û dijminatiya gelê Kurd
»»» R:8



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (453) 07-09-2023 Buha (1000) Tûmen

## Bangewaziya hizb û aliyên siyasî derheq mangirtina giştî ya roja 25ê Xermananê

**Civatên xebatkar ên xelkê Kurdistanê!**

Xebatkarên siyasî û medenî!

Di roja 25ê Xermanana 1401an de, Jîna Emînî keça Kurd a ciwan û xelka bajarê Seqizê, li bajarê Tehran û di encama êrîş û lêdana hêzên tepeserkar ên rejîmê canê xwe ji dest da.

Navê Jînayê wekî ser tirba wê hatiye nivîsandin, bû remza serhildaneke girseyî ya berfireh ku ji Kurdistanê ve bi dirûşma "Jin, Jiyan, Azadî" hate destpêkirin û gelek pê neçû ku seranserî bajar û herêmên Îranê û derveyî welat jî li xwe girt û di berdewamiyê de bi şoreşa "Jîna" û şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" hate nasîn.

Şoreşa Jînayê serhildan û nerizayetiya herî dirêj û girseyî ye ku karî desthilata Komara Îslamî bixe jêr pirsyarê û di pêxema herifîna wê rejîma tepeserkar de pêngavan bihavêje. Di heyama sala derbasbûyî de û di pêvajoya vê şoreşê de tevgera azadîxwaziya xelkê Îranê bi giştî û xelkê Kurdistanê bi taybetî qonaxeke nû û girseyî li dijî rejîma deshilatdar di Îranê de ceribandin û pêngavên qahîm hilgirtin ku rawestan û bi paş ve vegerîn jê re nîne. Rola berçav a Jinan di pêşengayetiya wê şoreşê de, ji aliyê civakî ve civata me pêngaveke mezin ber bi pêş ve bir û paşeroja serkevtinê rohntir kir. Ciwanan gelek mêrxwasane ji bo gehîştin bi jiyaneke azad û dilxwaz cangoriyek bê mînak dikin.

Di salvegera destpêka şoreşa Jînayê de di cihê xwe de ye ku bi nîşana bilindnirxandina yad û bîranîna şehîdên wê şoreşa nû û rêzgirtin ji cangoriyan û girtiyên siyasî û zindîragirtina tevgera siyasî, bi qedirgiranî ve em ber bi vê yada mezin a siyasî û civakî ve biçin. Di vê derheqê de piştî çend car hevdîtin û şêwirmendiya siyasî, roja Çarşemî 15ê Xermanana 1402an a Rojî, hizbên siyasyî yên Kurdistana Îranê yên wek:

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê
Komele (Rêkxistina Kurdistanî ya Hizba Komonîsta Îranê )
Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK)




Saziya Xebata Kurdistana Îranê
Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK)

Komela Zehmetkêşên Kurdistanê

Li ser wan xalanan lihev kirin:

1- Piştevanîkirin ji daxwaziyên xebatkarên civaka medenî û rêkxistinên serbixwe ji bo rêzgirtin û beşdariya çalakane di salvegera şoreşa Jin, Jiyan, Azadî de.

2- Ragihandina roja 25ê Xermananê, wek roja mangirtina giştî li hemû Kurdistanê. Di vê rojê de hemû dukan û bazar û navendên kar û îdarî têne daxistin; danê sibêzûya wê roja (25ê Xermananê) cemawera xelkê Kurdistanê serdana tirba Jînaya ciwanemerg û tev şehîd û cangoriyên şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" li bajar û gundên Kurdistanê dikin û deste gulên rêz û xoşewîstiyê danêne ser gorên wan û rêûresmên rêzgirtina ji wan lidar bixin.

3- Em daxwazê ji tev xelkê azadîxwaz ên Îranê (jin, ciwan, kirêkar, mamosta û malnişînkiriyan, Jîngehparêzan û netewên bindest li seranserî Îranê) dikin da ku piştevaniya mangirtina xelkê Kurdistanê bikin û bi mangirtina giştî, nîşanê hemû kesî bidin ku şoreşa "Jin, Jiyan, Azadî" heya gihîştin bi armancên xwe dê her wisa berdewam be.

4- Em daxwazê ji hemû xebatkar û hêz û aliyên pêşkevtîxwaz li derveyî welata dikin ku bi hemû awayekî piştevaniya mangirtina giştî ya 25ê Xermananê bikin û di wê rojê de xwenîşandan û rêpîvanên girseyî lidar bixin û bala civaka mirovdost ên cîhanê bo piştgîriya şoreşa Jînayê rabikêşin.

5- Her yek ji hizb û aliyên siyasî yên Kurdistanî yên beşdar di vê komcivînê de, piştgîrî û beşdariya xwe li mangirtina roja 25ê Xermananê û rêûresmên li ser gora şehîdan û cangoriyan radigihînin.

Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê

15ê Xermanana

# Yekdengî remza serketvinê ye



**Nûredîn Sofîzade**



Di dîroka xebata rizgarîxwaziya netewa Kurd de, ewa ku tim bûye sedemê şikestê û Kurdan di hember dijminan de kêm aniye, tenê û tenê nebûna yekîtî û yekrêziya di navbera xebatkaran û aliyên siyasî yên şoreşvan bûye, lê berevajî ger yekîtî û yekrêzî hebibe ku di dîrokê de em şahidê zaf tomarên serkevtinê bûne bi hegera yekrêziyê.

Gelek caran dijmin û dagîrkerên Kurdistanê ku li hember berxwedaniya yekrêzî ya Kurdan şikest xwarine û torandine, kevtine pîlangêriya têkdana yekrêziya di nava Kurdan de û mixabin gelek caran karîne aliyên xebatkarên nava tevgera rizgarîxwaziya Kurd ji hev veqetîne û her ev jî dibe sedem ku dijmin bi ser Kurdan de serbikeve.
Bi berçavgirtina vê rastiyê ye ku dijmin û dagîrker ji yekîtî û yêkrêziya Kurdan ditirsin û bi`ecîne.

Her wekî her aliyek dizane salekê berî niha şoreşeke seranserî li Îranê li dijî dîktatoriya Wilayeta Feqîh serî hilda ku vê şoreşê di serî de ji Kurdistanê ve hate destpêkirin, her lewra rejîma hov sebebkarê serhildana vê şoreşê Kurd û partiyên pêşeng ên xebata netewî li Rojhilatê Kurdistanê dizane û ji çavê Rojhilatê Kurdistanê ve dibîne.

Şoreşa li jêr dirûşma Jin, Jiyan, Azadî ku bi hegera kuştina keça Kurd (JÎNA) ji aliyê hêzên tepeserkar ên rejîmê ve destpê kir, renge ti aliyeke Kurdistanî û seranserî di Îranê de pêşbîniya vê nekiribe, lewma di demekê de ku tenê Kurdistan bi hişmendiya siyasî û yekîtiya netewî ve alahilgir wê serhildanê bû ku piştre bala xwe kêşa bi ser hemî Îranê û heta derveyî welat jî, vêca astengî û kêmasî û pirsgirêk li ser rêya şoreşê xwe derîxistin.

Kêmasî û arîşên wek: Nebûna alternatîva rejîmê, nebûna rêberiyek di astê opozîsyona seranserî de, nebûna bername û sîstema paşerojê ya birêveberiya welat, ev nebûnane jî mixabin bûne sedemê dilsarî û bê hivîtiya xelkê azadîxwaz ên seranserî Îranê, û di vê navberê de rejîm xwe serkevtî dizanî, û kar û kiryarên hin binav aliyên opozîsyonê bo mînak "menşûra corc tawan" ji aliyê kurê Şahê sernixûnbûyî û hin selbêrtiyan bi qazancê rejîmê û derbe êdan ji şoreşê dawî pê hate.

Lê ev tenê rûyê xuya yê kaxetê ye û rûyê dinê hin rastiyên din dide xuyakirin ku ev jî ev e ku aliyê kêm hemû netewên bê maf û bindest ên Îranê ji bo sernixûniya vê rejîma dîktator dixebitin da ku bi mafê diyarîkirina qedera xwe bigihin; me dît ku heya niha jî digel be, peşqelê agirê şoreşê li Kurdistan û Belûçistan û herêmên din yên netewên jêr dest li dijî rejîmê berdewam e û dîktatoriya îslamî ti pêgehek di nava wan de tinîne.

Şoreşa Jînayê bi hemî avayên xwe di nava jin û keçên azadîxwazên seranserê welat de berdewam e û jinên pêşeng ên şoreşê careke din amade nînin da ku vegerine ser rewşa berî şoreşa JIN, JIYAN, AZADÎ û rejîm ji firedana laçka destê zorê û pora jina û azadiya Jinê bi`eciye û sernixûniya xwe ber çavê xwe dibîne.

Ciwanên welat dixebitin û benda vê rojê ne ku bi neman û sernixûniya vê rejîmê, ev jî wekî ciwanên welatên pêşkevtî bigehine azadî û kar û jiyaneke serdemiyane.

Ku wisa ye xeyala rejîmê bilqên ser avê ne û nekariye dengê şoreşê mat bike û di rastî de şikest xwariye û roj bi rojê ber bi kendalê sernixûniyê ve diçe; zêdebarê padiganîkirina Îranê û pê derba şîr û tepeseriyê wisa dizane ku dê bikare bo heyameke dinê deshilata xwe ya reş ji sernixûniyê biparêze, lê bêguman qedera vê rejîmê jî wekî hemî dîktatorên gelek ji vê bi hêztir tenê sernixûnî ye.

Îro rojê em dibînin ku ji bo berdewamiya şoreşê û hivîdan bi xebatkarên azadîxwaz bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê, hemî part û aliyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê zêdebarî hemî cudahiyên siyasî û îdolojîk û fikriyên xwe, amade ne ku bi yêkdengî sergêriya tevgêr û şoreşê bikin û her yek ji wan aliyên siyasî gorî hêz û pêgeha xwe di nava xelkê xebatkar ên Kurdistanê de rol bilîzin û bibe cihê hêviya gel û vê hêcetê nedine dest dijmin ku ji netifaqî û yeknebûna wan li dijî gelê me mifahê werbigire.

Bêguma yek dengî û yekîtiya hêz û aliyên siyasî yên Kurd dê bandora xwe hebe li ser netewên dinê û opozîsyona seranseriya ku bawerî bi azadî û demokrasî û wekheviyê hene.
Vê carê yekîtiya hêzên Kurd hem bo jêfêrbûna xebatkarên seranserî Îranê dê rol hebin, hem dikare pêgela Kurd li nava opozîsyonê de bide kivşê ku êdî çiyê din ev jî bi sivikî bera xwe nedine daxwaz û mafê netewî yê Kurd û netewên dinê, hem dikare hêz û aliyên siyasî yên netewên bindest li dora bernameyeke hevpar ji bo Îrana piştî rejîma dîktator a îslamî, kom bike, hem jî ji hemiyan girîngtir, derfeta serkevtinê nede rejîmê ku ji netifaqiya nava hêzên siyasî bi qewlî dibêjin masiyan bigire.

Ku wisabye bi hemî kesî re rohn e ku serkevtin tenê di yekîtî û yekrêziyê de ye.

# Şoreş bi pêşengiya jinan



**Ebdulah Hicab**



Salekê beriya niha, di wan rojan de Rojhilatê Kurdistanê di nava coşa serhildanan de bû. Netewa kurd ji keça xwe, Jîna Emînî ku roja 20.09.2023 (22.06.1401) bi awayek hovane ji aliyê çeteyên bi navê polîsê exlaq yên Komara Îslamî ve li Tehranê hatibû kuştin xwedî derket. Navê Jîna, weke ku diya wê ya dil bi kul ji dil anîbû ziman, bû sembola berxwedan û têkoşînek nû ji bo azadî û wekheviyê. Bi navê Jîna li hemû bajar û bajarokên Kurdistanê, li gelek gundan û di nava civaka kurd ya li derveyî Kurdistanê de, pêlek serhildanan destpê kir ku piştî çend rojan li piraniya bajarên Îranê jî belav bû.

Kurdan bi diruşma «Jin, jiyan, azadî» dubare Kurdistan kire pêşengê têkoşîn li hember zordarî û paşverotiyê û agirê şorişek nû, wê carê bi pêşengitiya jinan vêxist. Bi saya ezmûna têkoşîna bi dehan salan, wan serhildanan zemîne ji bo şorişek berfireh di zêhniyeta civakê de amade kir ku niha roj bi rojê pitir bandorê li ser civak datîne û rêjîma mirovkuje Komara Îslamî zêdetir bi tirsa nemanê re tîne himberanî hev.

Tirs û dijkiryara rêjîmê li hember serhildanên civakî li seranserî Îranê bi zelalî nîşan dide ku şorişa nû mewdaya di navbera civak û sîstemê de hê zêde kiriye û niha deselatdarên Tehranê bi alingariyek dîrokî re aniye himberanî hev. Ji bo cara yekê di dîroka rêjîmê de, karbidestên pile bilinde Tehranê neçar man wê rastiyê bi zelalî bînin ziman ku sîstema perwerdeya wan, îdeal û pîvanên wan yên felsefî, exlaqî û heta olî jî ji aliyê piraniya civakê ve têne red kirin. Berfirehî û kûraiya serhildana sala par rêjîm xiste nava şokek wisan mezin ku heya demek xweş piştî destpêkirina serhildanan, hêzên serkutker nedizanîn çawan û li ku xwe û sîstema xwe biparêzin. Ji ber wê hindê bû ku piraniya kuştin û girtinan, her wisan êrişên ser baregehên hêzên Kurdistanî çend rojan piştî pêla yekê ya serhildanan û wê demê destpê kir ku şokê hemû laşê rêjîmê tevizandibû.

Lê berteka Komara Îslamî li hember netewa kurd û hêzên siyasiye Kuridstanê, beriya ku nîşaneya xurt bûn û amadeiya rêjîmê ji bo xweparastinê be, nîşan da ku sîstim çi qas ji xelkê Kurdistanê û pêşengên şorişa «Jin, jiyan, azadî» ditirse. Rastiya wê pirsê wê demê pitir derket dema ku me dît hevterîb li gel wan êrişan, rêjîmê di asta navneteweyî de çi qas xwe paş ve kêşand û çend avantaj dane welatên weke Erebistana Siûdî, Amerîka, welatên Yêkitiya Ewrûpa û heta Îsraîlê jî.

Tirsa Komara Îslamî ji vedeng hatina dubareye civakê di salvegera şorişa «Jin, jiyan, azadî» de niha ji her demê zêdetir e. Sala çûyî ji bo karbidestên rêjîmê, ji 44 salên berêye deselata wan pitir bi dijwarî derbas bû. Di wan 12 heyvên dawî de, bi caran Xameneyî û hevalbendên wî tirsa hilweşîn û tinebûnê bi çavên xwe dîtin û weke gotî ji tirsan «rojê çend caran mirin û zindî bûn». Seferberiya wan ya dawî, gef û gurên li ser hêzên Kurdistanî û civaka serhildêr li seranserî Îranê dikeve çarçoveya wê tirsê.

Li gel wê rewşê jî, wê ne rast be ku em bikevin davik baweriyek wisan xweşîn û safîlok ku çûna rêjîm nêzîk û hêsaye. Weke xuya, piraniya şiroveyên xweşbînaneye rewşê, ji eqlaniyetê pitir, xwe dispêrin hêvî û heza guhertina bi lez û xweziya şikandina sitûnên deselata dîktator. Lê ya xuya û ber bi çav ewe ku her çend rewşa rêjîmê niha li her alî ve li gor salek berê hêj xirabtire, lê carê sitûnên serekeye deselatê li ser ciyê xwe ne. Raste ku abûriya welat serûbin bûye, hejarî û belengazî çend qat çûye serî, bihayê dirafê welat gihîştiye asta herî nizim, hin ekterên giringe zincîra dûr ji bazneya deselatê weriyane û pişta xwe zivirandine hevparên xwe yên pêşîn û hin karbidestan xwe ji bo revê amade kiriye, lê hêj bazneya şidyaiye dora deselatê neşikestiye.

Niha piştî salekê, rêjîm dubare gefê li li civakê û hêz û partiyên siyasiye Rojhilata Kuridstanê dike û ne dûr e ku xwe ji bo êrişan jî amade kiribe. Ji aliyek din ve pêlek nû ya girtin û binçav kirina rexnegir û dijberan destpê kiriye û gelek çalakvanên medenî, parêzer û kesayteiyên civakî hatine girtin. Heta ne dûre ku ew rewş hêj tarîtir bibe û rêjîm ji caran zêdetir li hember xelkê tund û tîjiyê bi kar bîne. Her çend ku ew zext û serkutkirin demkî be û çareyekê ji halê aloze rêjîmê re neke jî, lê dikare bandorê li rewşê bike û atmosfera germe nava civakê hinekê bitevizîne.

Niha pirs ewe ka gelo wê rêjîm bikaribe bi wê siyasetê pêvajoya nemana xwe bisekinîne û xwe ji agirê kîna civakê biparêze? Bê guman na. Di heman demê de divê em çav vekirî temaşa rewşê bikin û hêvî û pilanên xwe nespêrin qeder an xweşbîniya bê bingeh. Xweşbînî wê demê dikare alîkar be dema ku hêza guherîner li qadê be. Wisan nebe, wê ekterên siyasî bikevin davikê û bi siyaseta şaş pêvajoya şorişê asteng bikin, weke çawan ku me dît di kelekela serhildanan de hin alî û kesayteiyên siyasî bi hêvya ku rêjîm ketiye serjêriya hilweşîne û ber bi nemanê ve diçe, lez ketin û bi hilsengandinên şaş zerbe li pêvajoya şorişê dan.
Li Rojhilata Navîn û Îranê piraniya bûyerên çarenûssaz zû bi zû nayên pêşbînî kirin û guhertin hin caran bi lez û di demekê de çê dibin ku ekterên siyasî ji guhertinan re ne amade ne. Lê heke pêvajoya şorişa «Jin, jiyan azadî» bi awayek xwezayî û normal here pêş, tê payîn ku hin faktorên navxwe û derveyî qedera rêjîmê diyar bikin û bandorê danên ser pêvajoya hilweşandina deselata dîktatore komara Îslamî. Wê pêvajo bi şorişa «Jin, jiyan, azadî» re destpê kir, lê carê dirêjayî, encam û qedera wê ya dawî ne diyare.
Girîngtirîn faktorên ku dikarin qedera rêjîmê biguherin, bûyerên nava Îranê bi xwe ne. Renge şaş be ku man û nemana rêjîmê bi tenê bi mirina Xameneyî ve bê girêdan, lê ew sitûna sereke

»»» Dom R:4



»»» Doma R:3

ya parastina wê rêjîmê ye û dema li nav çû, zehmete ku kesek din bi heman îqtidarê bikare ciyê wî bigre. Hewldanên Xameneyî û sîstemê ji bo amade kirina cîgirê wî, heya niha bê encam maye. Kurê wî, Mucteba ne ew kese ku bikare ciyê babê xwe bigre. Renge di nava sîstemê de jî wî ew giraî nebe ku bibe cîgirê babê xwe. Reîsî ku yek ji hêviyên Xameneyî ji bo tijî kirina kursiyê Weliyê Feqîh piştî nemana wî bû, çi hitbar di nava civakê û heta navendên girînge biryardanê de nîne û zêdetir weke qeşmerek derewîn tê temaşe kirin ku haya wî li rewşê nîne. Nemana Xameneyî dikare otorîte û hêza Weliyê Feqîh kêm bike û bi wê yekê re jî çira temenê rêjîmê ber bi temirandinê ve bibe.

Li Îranê pirsa «hilbijartinên» Meclis û serokkomariyê ne mijarên cidî yên siyasî ne ku bandorê li ser çawaniya birêveberiya welat danên. Di bingeha xwe de bi wan hemû fîlter û destverdanên deselatê re, mijarek bi navê hilbijartin li Îranê çi wate nîne. Li gel wê rastiyê jî kandîdên serekeye deselatê kî û li her ku bin, xelk bêzariya xwe ji deselatê di şexsê wan de nîşan dide. Ne girîng e ku di dawiyê de kî ji fîlterên rêjîmê derbas dibe, ya girîng ewe ku dengê dijberiy li hember rêjîmê bi wê hêcetê bilind dibe. Dema em bi wî çavî temaşa rewşê bikin, divê em wê hindê jî bibînin ku niha meydana manovrên rêjîmê pitir teng bûye. Çunku heya niha Komara Îslamî her du rûyên xwe yên ne pak; hem «reformxwaz» û hem jî «parêzvan» li qada «hilbijartinan» ceribandine. Êdî niha tiştek nû nemaye ku Xameneyî û hevalbendên wî biceribînin an bikarin xelkê pê bixapînin. Ya niha di destê rêjîmê de, supa, çek, diraf û bazirganiye. Bi wan emrazan jî nikarin heta dawî li hember îradeya xelkê bisekinin. Ji niha û pêve, xelk û deselat bi awayê raste rast li hember hev sekinîne. Deselat roj bi rojê qels û bizdiyayî, û gelên Îranê gav bi gav bi biwêrî û netirs ji bo mafê xwe yê biryardanê ber bi pêş diçin.

Serhildanên wê yek sala derbas bûyî bi zelalî nîşan dan ku nivşa nû li Îranê bi hêvî û îdealên Komara Îslamî najî. Rast berovajî, ew nivş azadî û guhertinên bingehîn dixwaze. Piştî destpêka şorişa «Jin, jiyan, azadî», piraniya karbidestên herî pile bilinde rêjîmê li xwe mukur hatin ku siyaseta wan ya perwerde û kultûrî, pîvanên wan yên îdeolojîk û bi giştî bingeha baweriyên ku wan di nava çil û çend salên derbas bûyî de dixwestin li Îranê bidin rûniştandin, niha wala derketiye. Nivşa nû guh nade wan pîvanan û ji rêyên nû ji bo derbasbûn li rewşa ku Komara Îslamî çê kiriye, digerin. Lewma roja ku ew nivş mezin dibe û dikeve nava karûbarên birêverî û deselata welat, wê rojê êdî tiştek bi navê Komara Îslamî nikare xwe li ser lingan bigre.

Her ew nivşa nû ku hebûn î îdelaên Komra Îslamî ji xwe re asteng dibîne, berdewam li hember rêjîmê disekine û ji niha û pêve jî wê her dema ku derfet dît, bi dengê bilind dijberiya xwe li hember rêjîmê nîşan bide. Wan xort û keçên ku sînûrên tirsê derbas kirine êdî bi lêdan, girtin, kuştin û gefan gavan paşve navêjin. Di nava wê nivşê de, bê guman zarok û kesên deselatdaran, hêzên çekdar û berpirsên pile bilinde rêjîmê jî hene. Tund û tîjiya deselatdaran li hember wan kesên ku guhertinan dixwazin, dikare bandorê li ser bazneyên dora deselatê bi xwe jî danê û her carê beşeke deselatdaran ji rêjîmê veqetîne, an her nebe wan bixe nava rewşekê ku êdî nexwazin heta dawî deselata Komara Îslamî biparêzin.

Pirsa abûrî, buhabûna pêwîstiyên jiyana xelkê, bêkarî, tûşbûna hêj zêdetire bi madeyên hişber, ji destdana buhayê dirafê Îranê û bê hêvîbûna xelkê ji pêşerojê di nava wan faktorên abûrî û civakî de ne ku asta dijberiya xelkê li hember deselatdaran zêde dikin. Ew rewş zêdeyî çil salane ku pêsîra xelkê Îranê girtiye, lê heya niha bandorek wisan zêde li ser rêjîmê bi xwe nekiriye. Niha ne dûre ku berdewamiya wê rewşê êdî qirika deselatdaran bi xwe jî bigre û bêhna tale pirsgirêkên civakî û abûrî here difin û qirka rêjîmê.

Di asta herêmî û cîhanî de jî zêdegaviyên bê reje yê rêjîmê dikare serê wê zêdetir bêxe nava belayê. Bigir bikêşa rêjîmê bi Amerîkayê re li Rojhilata Navîn berdewam e. Rewş li Êraq û Sûriyê ji ber destverdanên Komara Îslamî niha zêde aloze. Projeya atomiye Komra Îslamî gihîştiye qonaxekê ku êdî zehmete bê kontroll kirin û ew yek fukarên cidî ji bo Îsraîl û hevpeymanên Amerîkayê li derdora Îranê çê dike. Hevpeymanetiyên serbazî, ticarî, abûrî û hwd bi Rûsya, Çîn û Korea Bakûr re, bi taybet mijara firotina dronan bo Rûsiyê ji bo ku di şerê Ukraînê de bikar bîne û gefa êriş kirin bo ser armancên abûrî, neftî û deryayî li Kendav û derdora wê, giriftên cidî ne ku Komara Îslamî ji bo aştî û aramiya cîhanê çê dike. Hevterîb li gel wan zêdegaviyam, gefên ku li herêma Başûrê Kurdistanê dike û pilana êrişa îhtimaliye çekdarî bo ser binke û baregehên partiyên siyasiye Rojhilat ku li Başûr dimînin û gelek pirsên wisan bûne heger ku Komara Îslamî ji bo piraniya aktorên biryarder li cîhana Îro bibe pirsgirêk cidî ku êdî neyê tehemul kirin.

Dema rewşa welat ji ber her yek ji wan faktorên ku hatin bas kirin an ji ber her bûyerek din ku niha nayê pêşbînî kirin aloztir bibe, wê demê ne dûre ku êdî ew kesên niha Komara Îslamî diparêzin, berjewendiya xwe di parastina rêjîmê de nebînin. Di rewşek wisan de wê çira bextê rêjîmê xwe nikare xwe ji ber ba û bahozên nava civakê bigre.

# Hîsam Destpîş: Divê vê carê ber çavê xelkê rohn be ku eger şeqam kevtine destê wan, ji dest nedin û bikarin bi îrade ve şeqaman bi rê ve bibin



Me li derheq salvegera şehîdbûna Jîna Emînî û serhildana xelkê li dijî rejîma Komara Îslamî ya Îranê digel Şirovekarê Siyasî, rêzdar "Hisam Destpîş", hevpeyvînek kir û çend pirsên wek "xelkê Kurdistan bi taybet û Îran bi giştî dê di salvegera şehîdkirina Jîna Emînî de rabin. Çima Tirk tevlî serhildanê nabin. Divê xelk di niha de çi rêkarekê bigire ber xwe ji bo serhildanê. Di egera rabûna xelkê li dijî rejîmê, divê xelk çi alavekê li hember rejîmê bikar bînin?" Û çendîn pirsên dinê anîne ber behsê.

**Hevpeyvîn: Sîbel Xubayî**

**P:** Bi nerîna te xelkê Kurdistan bi taybet û Îran bi giştî dê di salvegera şehîdkirina Jîna Emînî de rabin?

**B:** Eva ku di salvegera şehîdkirina Jîna Emînî de serhildan çê bibe, bestênên cur bi cur di Îranê de hene, yanî me jîngehek heye bi navê Kurdistan û jîngehek jî bi navê Belûçistan, Azerbaycan û navçeyên Farsan û Ereb û Tirkemen hene ku, her yek ji wan taybetmendiyên xwe li derheq guherinkarî û serhildana bê, hene; Bi nerîna min eva ku roh û diyar e li navçeyên Kurdistan û Belûçistanê bi diyarîkirî ye ku tê çavnihêrîkirin û bi alxahînî ve mijarek tê gorê, lê dibînî ku pirsgirêkek bingehîn di Îranê de heye ku ev jî du cemseriya Tirk û Fars e ku çawa di wê heyamê de ji serhildanê têgihîştine yan naxwazin tê bigihin û yan jî çawa dixwazin mijarê yekalî bikin. Bi nerîna min Fars û Tirk hêşta amadehiya vê yekê di wan de nîne, çimkî pirsiyarên gelek mezin hene ku di pantiya siyasî de nekarîne bersiva wan bidin yan jî nekarîne ji mijara pawanxwaziya nasnameyî û oliya xwe dev berdin û herçiqas rastî pirsiyarên mezin hatine, lê nekarîne bi dirustî bersiva wan bidin û nikarine berçavrohniyan bidin û Tirk bi heman şêwe di nav sê cemseriya Tirkbûn, Îranîbûn û Azerîbûnê de gîr kiriye û esasen nekarîne ji vê yekê derbas bin û cuda ji vê yekê îlîtên emrazî hene ku xwediyê sermaye ne û ev îlîtane di çarçêveya hêza di Îranê de têkel bûne ku xwediyê hêz in li Tehranê ku hêşta bi wê dûredîmenê negihîştine ku veqetîn ji Tehranê dikare bi qazancê wan be; lewma ez bi giştî dikarim bêjim sîmayekê li salvegera Jînayê wêne bikim ku wekî destpêka wê, meydanên serhildan û şoreşê ku li Kurdistan û Belûçistanê hene û ew yeka berdewamiya wê hebe û êdî dimîne ku em divê bizanin li xwarê civaka Fars û Tirk û li xwarê civaka ev beşa nifşa nû li çarçêveya Fars û Tirk hatine meydanê ku bi teibîra resmî mijûl dibin yan jî li cem wan têgihîştinek çê bûye û bixwazin ji vê rêyê ve tevlî serhildanê yan gemeya siyasî bin. Di vî warî de hêşta nîşaneyeke micid nîne ku mirov bikare bêje ev jî têne nav wan meydanan, ger pirsgirêka rojane a aborî wan pal bide nava şoreşê.

**P:** Divê xelk di niha de çi rêkarekê bigire ber xwe ji bo serhildanê

**B:** Em dîsan nikarin hukmeke giştî bo xelkê bidin, eger bingeha me ev bûya, eva ku ji destpêka şoreşê ve hate gorê, bi vê wateyê ku Tehranî bi vê encamê gihîştinûn "Tehran bişê Kurdistan û Îran mîşê Gulistan", eger ev mentiqe zal bûya, wê demê me dikarî bîr ji vê yekê bikin ku çawa rêkxistinek giştî bête gorê û di esasê de xelkê bêne dora hev û kom bibin û serhildan ber bi arasteyek din ve biçûba, lê ya ku bidiyarîkirî ji me re rohn bû, eva ye ku em çawa mêzeyê navçeyên cuda bikin? dizanî çima dibêjim? çimkî berdewam em divê esasê werbigirin û mijara serhildanê pêka navçe, nîştiman û nasanemya ku di wan navçeyane de heye bibînin. Ji ber ku ev navçeyane curê reftara siyasî û bîrkirin û piraktîka siyasî esasen bi wan xelkan dibexşin; lewma ez li ser wê bawerê me, divê ridbûn û hemû hêza xwe di vê yekê de kom bikin ku li Kurdistanê divê çi bikin; Yekem pêngav li Kurdistanê ev e ku em di warê siyasî û berkevtina siyasî de xwe dûr bigirin, çimkî esasen mijar em nînin ku em xwe pêve mijûl bikin û bikine mijareke mezin û beravajî divê rewşek aram çê bikin, çimkî li Kurdistanê çêbûna vê rewşa aram gelek girîng; Çima ev yeka girîng e? ji ber ku hem xelk berçavê wan rohn e û dizanin çi dixwazin, kê ye, çi ye û çi dixwazin? Eger ji vê songehê ve aramiyek dirust be, bi alxahînî ve Kurdistan bersiva her cure serhildanekê dê dide. Ku wisa ye pêngava yekem ev e ku me rewşeke aram li pantahiya tevgera xwe ya siyasî de hebe û êdî em virde û vêde nekin. Bi wê wateyê ku em tex û qatên Îranê li pey xwe rabikêşin û digel wan eniyan çê bikin. Duyemîn pêngav ev e ku, di piraktîk de em dixwazin di vê salvegerê de çi bikin, û vê yekê bi eşkere behs bikin û bibe bi rojev û bi xelkê xwe îşare bikin ku em xwe bo çi amade dikin. Axo em xwe amade dikin tenê bo mangirtin û hatina ser şeqaman di heyameke kêm de? Bi nerîna min ev yeka ne dikare mentiqî be û ne jî dikare bersivdar be. An jî em xwe amade bikin bo serhildanek giştî, bi wataya wê ku rasanake yekcarî be ku civatan li dora hev kom bike. Ya din jî ev e ku em wekî hizbên siyasî, ji çi dîtingehekê ve em dixwazin mêzeyê vê salvegerê bikin. Axo bi wê watayê em jê binêrin ku rêkxistinek nû çê bikin ku em bikarin şûr bine nava civakê û em bikarin digel civakê têkel bin û em bixwazin îradeyek bi kom a nû çê bikin. Eger em bikarin wan mijaran li cem xwe yekalî bikin, wataya wê dibe ev ku civata me çi karekî encam bide. Ez wekî xwe li ser wê bawerê me ya ku girîng e ev e ku xelk bixwe, xwe amade bike; xwe amade bike bi wataya ku îmkana wê nede bi dagîrker ku konterolê ji Kurdistanê ve dest pê bike, û bikare vê kontirolê lerzîn bike. Îcara eva bi dû emrazên gelek girîn tê girin, ya yekê ev e ku me emrazên dijwar bi dest hebin û xwe rêk bixin. Ya duyem jî divê me emrazeke nerm hebe, wate şeqam bi destê me bin da ku em bikarî îradeya xwe ya bikom nîşan bidin. Êdî dimîne em di wî warî de wekî xelk, me ew amadekariye heye yan ne. lê girîng ev e ku em bikarin wek çawa me karî li Mihabad, Ciwanro, Sine, Pîranşehr û Şino û komek bajarên din, îradeya dagîrker bixine jêr pêrsiyar, vê carê jî em bikarên wê îradeyê berdewam bikin.

**P:** Bi nerîna te menca vê carê ya serhildanê tevahiya Îranê li xwe digire?

**B:** Wekî min di bersiva pirsa yekem de îşare pê kir, aliyê kêm heta vê gava ku em tê de ne û diaxivin, çi îşareyek wisa nîne û esasen guherîn li Îranê tûşî astengî û bombestek mezin bûye ku eva ye ku şûr nabe nav tevahiya Îranê û sedamên wê jî rohn in. Esasen mintalîteya mirovê fars û mintalîteya mirovê Tirk, ew mintalîte nîne ku em çavnihêriyê jê bikin ku li deheq serhildan û derheq wê ku bêne nava rewşek nû; yek ji sedemên here girîng ev e ku tevgerek bi navê Jin

»»» Dom R:6

»»» Doma R:5

Jiyan Azadî çê bûye ku ewa daxwaza werçerxanek girîn ji mêjî, reftar û eqliyeta wan derheq Îran û paşeroja Îranê dike. Îcar eger ev reftar û mentiq û mintalîte baw be û yan hizûr hebe, tu pêka wî divê xwe biguherî yan bikarî guherinkarî di xwe de çê bikî û îmkana wê bidî ku ev guherinkarî çê bibe. Dema ku ew werçerxana fikrî pêş hemû tiştekî werçerxana piraktîkiyê çê neke, îhtimala wê ku ew mijare bi tevahiya Îranê de şûr bibe, kêm e; ewa xwendineke eqlanî ye. Xwendina duyem ev e ku di nava xwedî Îranê de eqliyeta xelk an nifşa nû digel Îranên derve yan Tirkan cuda ye û dixwazin bi şêweyekî din bîr bikin an wê werçerxanê ber bi wê yekê ve bibin ku curek din ji siyaset û bîrkirinê çê bikin.

Eger em ji vê songehê ve mêzeya vê mijarê bikin, ku xelk bixwaze bi curek din siyasetê bike, êdî ev di xeyala dîrokî û pawanxwaziya olî û nasnameyî de biçin, îhtimala vê heye ku belav bibe. Sêyemîn xal ku divê em berçav bigirin, mijara aborî ye. Xelk di warê aborî de rastî astengiyan hatine. Belkî ev yeka bikare paldanekê çê bike. Lê eva paldanek mezin nîne yanî mezin nîne, dirêjeder nîne û nikare zêde ber xwe bide; çimkî di dawiyê de pêwîstiya wê bi vê yekê ye ku eger bê nava serhildanê tiştek demdirêj hebe ku bikare palderê wê be ku ji bo wê fedakarî bê kirin û xwe goriyê wê armancê bike. Hekî ez bixwazim wê meselê hinekê kurt bikim, divê bêjim, me nîşaneyên gelek mezin nînin, lê di eynî halî de nabe em berçav bigirin ku xelk di heyama sala borî de ezmûnên gelek mezin bi dest xistine, û dimîne axo dikarin wî xelkî berevajî îlîtên Fars û Tirk ku li derve û navxwe de restî eqiliyeta kevn in yan qazancê wan yê niha ji wê yekê derbas bibin û detpêşxeriyek nû bîne gorê yan ne? Bi giştî eva ku ez niha dikarim bêjim, di niha de li gorî îşareyên niha, ev yeka îhtimala wê kêm e.



**P:** Bi nerîna te çima Tirk bi şêwazek pêwîst tevlî xwenîşandana cemawerî ya xelkê li dijî rejîma Komara Îslamî ya Îranê nabin?

**B:** Ev pirse ku girêdayî Tirkan e, mijarek gelek-gelek girîng e li derheq me Kurdan, çimkî cîranê me yê Kurd yan Kurdistanî, Tirk e. Li hemû sînorekî me digel wan mijar heye, çi mijarên siyasî, çi nîştimanî, çi mijara kangeh û qazanc, û tevlîbûna wan bi Azerbaycanê ve û ya me jî bi Bakur û Başûrê Kurdistanê ve. Bi ezmûnên xweş û nexweş wekî Komara Kurdistanê û mijara Nexedê, û bi giştî me dosiyeyên gelek zêde digel Tirkan hene. Lê eva ku bo Tirk nayên pêş? wekî berê min îşare pê kir, civaka Tirk esasen hilgirê du îlîtên esasî ye; Ya yekê, îlîta emrazî ye ku xwediyê sermaye ne û evên ku di warê sermaye û aborî de tevî Tehranê bûne û dîrokek dûr û dirêj hene. Ya duyem jî ev e ku nasiyonalîzma Tirk, ev nasiyonalîzmên Tirk ku me di Komara Azerbaycanê de dîtin, gelek cuda ne digel nasiyonalîzma niha ku heye. Nasiyonalîzma niha ya Tirk, nasiyonalîzmek negihîştî ye û esasen nekariye regeke civakî û tevgerek civakî li pişta serê xwe hebe, belkî zêdetir curek e ji destkir û curek e ji çavjihevkerî yan curek e bizawkirin wê ku li Tirkiyê û Azerbaycanê derbas dibe. Lewma vê yekê Tirk rastî paradoksê aniye û rastî tevlîheviyê kiriye û tûşî dijayetiyek gelek zêde kiriye. Tirk rastî sê pirsên pir girîng hatiye. Axo ew xwe Îranî dizan in bi wateya eva ku Îranî ne? Duyem; Axo ev xwe bi Tirkê Azerbacan dizanin bi wê wateyê ku bi xwe dibêjin tevlî welatê Komara Azerbaycanê bibin yan esas xwe bi pantirkîzm dizanin? Ew mijera ku li çarçêveya nasiyonalîzma Tirk li Tirkiye heye û ev mijarane wisa kiriye ku nasnameya Tirk, esasen nasnameyek nezelal be û nezane mijûlê çi ye û ber bi kuderê ve diçe. Heta dema ku îlîtên Tirk nekarin bersiva van pirsan bidin, nemumkin e ku bikarin berçav rohnî hebin û ne mumkîn e ku ber bi pêş ve herin û ne mumkin e ku înşetîvek gelek mezin û rohn hebin bo ev ku dixwaze çi bike.

Eger me ew çavnihêriye ji Tirkan heb ku ji wê paradoksê û li ser serşêwayiya nasnameyî de dijîn, tebî`eten di wir de dimîne ku ev îlîtaneyên Tirk ku dixwazin guherinkariyek çê bibe, û şiyana guherîna vê yekê hene an ne? Ez ser vê bawerê me ku zehmet e ew îlîtên Tirk ku li derve ne şiyana vê guherinkariyê hebin. Çimkî me wekî civak Kurd û Kurdistanê kariye ew yekangêriya hizbên siyasî û rêberayetiya siyasî digel civaka xwe çê bikin; lê ew beşa îlîtên Tirk ku li derve ne û hewsengiya rega civakî û kultûrî nînin ku bikarin bandorê li navxwe hebin û ji ber hindê ew îlîtên Tirk ku ew baladestî di wê mijarê de hene digel Tehranê têkel in û digel Tehranê di warê aborî, siyasî, ewlehî û leşkerî de hizûra wan heye. Bîra me neçe veqetîna Tirkan ji Îranê gelek hêsan nîne û wekî Kurd û Belûçan nînin; ji ber ku wan li dirêjahiya dîrokê di nav pêkhateya siyasiya nizam, ewlehî û aboriya Îranê de bûne, û eger bê û ew biryarê bidin ku ji wê mijarê veqetin, mijarek gelek esasî çê dibe û ez ser vê bawerê me ku tevahiya Îranê wek çarçêveyek cugrafiyayî, dixe jêr pirsiyarê û rûbirûyê şert û mercên nû dike. Lewma bi giştî ez dixwazim bêjim ku sedama vê ku çima Tirk nayêne pêş, ev nîne ku ew civake pêwîstî bi guherinkarî nîne, ne pêwîstî bi wê yekê heye ku ew civake nîne, wata tê de nîne û di piraktîkê de jî her tê de nîne û çavnihêriya wê yekê jî nakin ku bizane kê ne û ber bi kuderê ve diçin.

## Nerîna Lîderan



**“Vedant Patel”:**
**“Me bi rohnî gotiye ku berhemanîna Uraniyoma meyandî ya %60 ji aliyê rejîma Îranê ve ti armancek aştîxwazane ya rewa nîne”.**



**“Gila Gamliel”:**

**“Bi van zûyane dê guherinkariyek gelek mezin di Îranê de rû bide”.**



**Hannah Neumann:**

**“Divê derheq girtina “Flodros” li Îranê rohnkarî bêne dan”.**



**“Mihemedriza Qereyî Aştiyanî”:**

**“Hemû dorpêçên ku li ser cebilxaneya Îranê ne, dê di meha Rezbera îsal de bi dawî bibin”.**

# Rola Kurdpa ya salekê di şoreşa Jîna de



**N: Eskender Ceiferî**

Saziya mafên mirovan a Kurdpa ku niha di 13 saliya xwe de ye, hevdem ligel şoreşa Jîna, roleke wê ya bi bandor li ser eşkerekirina wan binpêkariyan heye ku di dema serhildanê de ji aliyê rêjîma faşîstên Tehranê ve têne kirin.

Ev salek e ku Kurdpa weke mîratgira şehîd Kawe Cewanmerd di çepera eşkerekirina binpêkariyên di serhildanê de ye.

Ev sazî, bi belavkirina rojane ya nûçeyên girtina welatiyan bi tometên siyasî û belavkirina belgeyan û herwisa çêkirina pêwendiyan di asta navdewletî de dive mînakek ji saziyên xwebexş di asta Kurdistanê de.

Wek baktiriyan, saziyan ku xwe wek parêzvanên mafên mirovan binav dikin, berfireh bûne. Di vê navberê de piraniya wan, tenê ji bo pere hatibûn avakirin, ji xwe piştevaniya aliyên navdewletî ji bo çalakvanên mafên mirovan jî bûye sedem ku fikra bazirganiyê berfireh bibe. Bi awayekî ku kesek dirabe û malperekê ava dike, navê wê didanî sazî û ji bo karên xwe, piştevaniya malî jî bi dest dixîne. Lê belê pêwîst bû saziyên wek Kurdpa, ajar vedin û bibin dengê binpêkariyên mafên mirovan li Kurdistana Rojhilat.

Di şoreşa Jîna de rola Kurdpa êdî xuyatir bûye. Ji ber ku gelek saziyên navdewletî jî wê weke çavkanî bi kar tînin.

Saziya Kurdpa ku ev 13 sal in çalak e û çend salan berî niha li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hate tomarkirin, di daxuyaniya xwe ya avakirinê de ragihand: “Rewşa nebaş a mafên mirovan li navçeyên cuda yên Îranê û kiryarên desthilatdariyê ji bo binpêkariya zêdetir, berfireh û berdewam a mafên mirovan, bûye sedemeke girîng ji bo avakirina saziyeke mafên mirovan a serbixwe. Ew sazî wê hem nûçe û zanyariyên derbarê wan binpêkariyan tomar bike û hem jî binpêkariyan bişopîne. Saziyeke bi vî rengî, dikare li wan navçeyan ku saziyên din li wêderê çalak nîn in, perwerdeya mafên mirovan danî. Li ser vê bingehê jî Kurdpa wek saziyek ku ne li ser pêgeha berjewendiyê hatiye avakirin, pişta xwe bi hin rojnamevan û nûçegihanên pêşketî germ dike ku ji berê ve li hin ji wan navçeyan kar dikin lê belê ew kes hatibûn piştguxistin. Saziya Kurdpa ji aliyê toreke çalakvanan ve ku ji heman navçeyan in, hatiye avakirin.”

Saziya Mafên Mirovan a Kurdpa, sala 2020’an li ser van 3 bingehan, li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatiye tomarkirin û çalakiyên xwe berdewam dike. Lê berî wê jî, ji yazde salan berî niha ve her çalak bû.

Kurdpa ku ji aliyê şehîd Kawe Cewanmerd ve hatibû avakirin û heya niha jî di çeper û rêbaza wî de ye, ni awayekî xwebexşane ji aliyê kesên dilsoz ve ji bo doza Kurd û mafên mirovan li Kurdistana Rojhilat bi awayekî bê beramber tê rêvebirin. Vê saziyê di beşeke din ji daxuyaniya xwe de tekez kiriye ku Kurdpa dixwaze kêmasiyan di warê nasandin û ragihandina binpêkariyên mafên mirovan de qerebû bike û vê valahiyê tijî bike. Li ser vê rêbazê jî 3 xalên sereke hene ku Kurdpa xwe bi wan wefadar dibîne;
Xala yekemîn ev e ku saziyên mafên mirovan dikevin bin bandora siyasetê. Saziya Kurdpa, wek bingeha xwe ya sereke, hewl dide ji bo eşkerekirin û ragihandina binpêkariyên mafên mirovan, ji siyasetê dûr be. Di vî warî de Kurdpa dixwaze serxwebûn û pêşketîbûna xwe biparêze û dûrî ramanên siyasî be.

Ev sazî, ramana xwe û enerjiya xwe, ji bo parastina mafên mirovan bi kar tîne ku di vê rêbazê de dehan qurbanî jî dane. Ne tenê rêveber û avakerê wê hate şehîdkirin, lê belê bi dehan rojnamevanên Kurdpayê jî çendîn caran ji aliyê dagirkar ve rastî givaşan hatin. Lê ji bo Kurdpayê, parêzvanîkirin ji mafên mirovan ji her tiştî girîngtir e. Lewma jî qet bixwe piropagende bi wan nekiriye.

Ji bilî van du xalan, saziya Kurdpa amaje dide xaleke din a herî girîng ku derbarê piştrastkirina zanyariyan e. Eger saziyek, hemû gotegotan wek nûçe belav bike, ne ew sazî dikare bibe cihê baweriyê û ne jî karê rêveberên wê, wek dilsozî tê binavkirinn. Kurdpa di beşa dawiyê ya daxuyaniya xwe de dibêje: “Xala sêyemîn jî ev e ku saziya Kurdpa, zanyariyên xwe ji xeynî çavkaniya sereke, ji çavkaniyeke duyem jî piştrast dike. Em zêdetir di vê derbarê de girîngiyê didin nûçegihan, parêzer û wan çalakvanan ku ji berê ve di vê mijarê de çalak in.
Ev pirose, ji bo me baweriyê li pey xwe ve tîne.”
Kurdpa û xebatkarên wê dibêjin heya roja ku binpêkariya mafên mirovan li Kurdistanê berdewam bike, ewê jî di karên xwe de berdewam bin. Herqasî jî ku qet piştevaneke madî ya wan tine be û ji aliyê endamên wê ve xwebexşane bê rêvebirin, lê dîsa jî xebata wan li dijî rejîmê pir girîng e ji ber ku beşeke zêde ji wan binpêkariyan eşkere dikin.

# Şerê Dêrezorê û dijminatiya gelê Kurd



N: Ebdulazîz Qasim



Her ji berî çend mehan ve, wiha dihat pêşbînîkirin ku şerekî mezin li demeke nêzîk li Dêrezorê di navbera hêzên girêdayî Amerîka û hêzên girêdayî Îranê û Hizbulahê de peyda bibe, ji bo vê armancê ji aliyê koalisyona navdewletî li dijî DAIŞê ya bi rêberiya Amerîka û bi alîkariya Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD), hêzeke leşkerî ji eşîrên Ereban (Encumena Leşkerî ya Dêrezorê) ji eşîrên erebên Dêrezorê hate damezrandin bo amadekariya şerekî wisa.

ku ji demek dirêj ve, hêzên Amerîka li Sûriyê hewla kontrolkirina tevahiya parêzgeha Dêrezorê didin û herwiha kontrolkirina tevaya sînorê Sûriye-Îraqê heta digihe sînorê Ordinê (Jordan) ji bo rêgirtin ji bizavên milîsên girêdayî Pasdarê Îranê û Hizbulah û girûpên bazirgankerên madên hişber, nemaze bazirganiya Captagon li van deveran, ku hêjayî gotinê ye tevî girîngiya cugrafî ya parêzgeha Dêrezorê herwiha girîngiyek aboriya mezin heye, ji ber neft û gaza wê ya zaf û zêdebarî girîngiya çemê firatê û çandiniya wê navçeyê.

Deverên Rojhilatê parêzgeha Dêrezorê, di sala 2019an de, ji dest rêxistina terorîstî ya DAIŞê bi alîkariya hêzên HSDê û hevpeymaniya navneteweyî ya li dijî terorê bi rêberiya Amerîka hatine rizgarkirin, lê bi carekî ev dever ji çeteyên DAIŞê nehatin paqijkirin û carnan jî, ji aliyê girûpên veşartî yên DAIŞê ve êrîşî li ser HSDê dihatine kirin; tevî ku hejmarên mezin ji van çeteyên terorîst ji girtîgehên Rêveberiya Xweser bi pişgirtiya eşîrên Ereban dihatin berdan û gelek ji wan tevlî hêzên parastinê yên Rêveberiya Xweser bûn, ku heta îro jî têkiliyên hin serokeşîrên ereb yên Dêrezorê û Hesekê bi aliyên cuda re hene, bi taybetî digel Îran û Tirikiyê û rêjîma Şamê.

Lewra li gorî gelek çavdêr û şirovekarên siyasî, bi çiraya kesek ya hêzên Amerîka, serokê Encumena Leşkeriya Dêrezorê (Ebû Xwela) hatiye girtin û tevî paqijkirina Encumena navbirî ji serkirdeyên wê yên têkilî û danûstandin digel rêxistina DAIŞ û milîsên Îranê hene, ne wek nûçeyên medyaya Erebî ya nijadperist ku hewl didin van oparsyonên leşkerî li Dêrazorê bêxin di çarçoveya şerekî neteweyî de, wek bi Şerê Kurd û Ereban binav dikin.

Her wekî em dibînin, ku têkiliya van oparsyonên îro li Dêrezorê bi şerekî veşartî di navbera Amerîka û Îranê de heye, ku Îran û Rûsiya bi awayekî eşkere û Tirkiya bi awayekî veşartî hewla dersînorkirina hêzên Amerîka ji Rojhilayê Sûriyê didin, ku gelek caran ev yek di civînên Astana û civînê dualî û sêalî di navbera Tirkiya-Rûsya-Îranê de hatiye dubarekirin, lewra em dikarin bêjin ku ti têkiliya oparsyonên niha yên li Dêrezorê bi Kurd û Ereban re nîne, û zêdebarî ku îro pitiriya şervanên HSDê yên niha li Dêrezorê ji eşîrên Ereban pêk tê, lê ji aliyê hin eşîrên Ereban ve, bi taybetî ew serokeşîrên girêdayî Îranê, Tirkiyê û paşmayên DAIŞê û tevlî opozîsyona Sûriyê hewl didin ku van oparsyonên leşkerî li Dêrezorê wekî şerekî Kurdî-Erebî binav bikin û gefan li Gelê Kurd dixwen, tevî ku hemû partiyên kurdî yên girêdayî PYD û ENKSê tekeziyê li ser pêkvejiyanê di navbera kurd, Ereb û Siryanan de dikin.

Dibe ku ev oparsyon bo çend rojên din dirêj bike, lê dijminatî û nijadperistiya Erebî li dijî gelê Kurd, dê bo demeke dirêj berdewam bike; ev dijminatiya ku bi dehan salan e ji aliyê dewletên dagîrker ve bi taybetî li Sûriyê ku ji aliyê partiya Be`is ya deshilatdar û niha ji aliyê DAIŞ û opozîsyona Sûriyê ve tê xudankirin, ku divê gelê kurd hişyar be li hember gef û metirisiya nijadperistiya Erebî û bi awayekî praktîk divê kar bibe bo misogerkirina mafên neteweyî yên gelê kurd û divê partiyên Kurdan dest berdin ji dirûşmên bê wate wekî yên niha têne pêşniyarkirin, di pêşiyê de divê kar bo rêkxistina navmala kurdî û peydakirina zemîna tifaq û yekrêziyê bê kirin.

Wek xuya ye ku partiyên kurdî heta niha nekarîne bi roleke kartêker rabin bi erkê xwe, nemaze ku miletê Kurd bi awayekî ji partiyên xwe bêhêvî bûye, hevdem dibînin ku hin rêxistinên civaka sivîl yên kurdan bi awayekî çalak kar dikin, û li vir hêjayê gotinê ye ku destxweşiyê ji xebata hin saziyên mafên mirov yên kurdî û Sûrî bikin li ser rola wan di mijara sepandina sizayên Wezareta Xezînedariya Amerîkayê li ser du aliyên dijekurd û terorîst yên girêdayî opozîsyona Sûriyê ya alîgirê Tirkiyê li Efrînê, ku ji aliyê Wezareta Xezînedariya Amerîkayê ve di roja 17ê Tebaxê de hatibû standin, ku dibe ev sizayên Amerîkayê li ser çeteyên dagîrker li Efrînê û herwisa şerê Dêrezorê û kodeteya Encumena Leşkerî ya Dêrezorê li ser HSDê, bibe wane û destpêk ku Rêveberiya Xweser û partiyan kurdan bi taybetî (ENKS û PYD) siyasteke nû û dirust di xizmeta doza Kurdî ya netewî de bipejrînin. Herwiha ji bo bidestxistina mafê neteweyî yên gelê Kurd, qazanc ji vê qonaxa niha ya Sûriyê bibînin.

# Bo serkevtina şoreşa «Jîna»yê di Kurdistanê de



N: Serbest Urmiye



Şoreşa Jînayê ku salek bi ser re derbas dibe û ji aliyê piraniya şirovekar û bîrmendên siyasî, civakî û ...hwd ve berfirehtirîn û xwedî bandortirîn serhildan di Îranê de li dijî rejîma Komara Îslamî ya Îranê hatiye şirove û naskirin.

Rewşa civaka Kurdistanê ya tejî ji bêdadî û bêmafiyê, derfetek yan hêncetek bû ku şoreşa Jînayê di Kurdistanê de bi lezgîn ve berfireh bibe û piraniya aliyên civakê li xwe bigire. Bi awayekî ku di qada serhildanên civakî yên modern de were pênasekirin. Bê direng şopandina nasnameya siyasî yan siyaseta nasnamexwziyê bû yek ji taybetmediyên wê şoreşê. Li gor pênaseya serhildanên modern ên civakî, nasnameya siyasî di serhildanên civakî de, wate şiroveya siyasî ji riftar û çalakiyên serhildanên civakî ye. Rewş yan biyavek bo civakek xwedî nasnameya neteweyî, olî, civakî, çandî û...hwd e ku hewl dide daxwaz û berjewendiyên xwe pêş bixe. Di serhildanên han de piraniya civakê bê berçavgirtina berjewendiyên civakên derdorê xwe, kar ji bo serxistina xwe dikin ku şoreşa Jînayê jî di civaka Kurdistanê de heman rêbazê dişopîne.

Di dema ku pênase, dirûşm û armancên serhildana şoreşa "Jîna"yê wate "Jin, Jiyan, Azadî" di civaka seranserî ya Îranê û bi taybetî civaka Fars ya navenda Îranê de hevşêweyê civaka Kurdistanê nebûn yan di hin derfetan de meşeke bervajî dane pêşiya xwe, gelê Kurd bi dirûşma taybetî, nasnameyiya siyasî li gor taybetmediyên civaka Kurdistanê bo şoreşa Jînayê pênase kir. Dengê bilind ê şeqamên Kurdistanê "yê heta kurdek bimîne, Kurdistan jî dimîne" yan "Kurdistan, goristana faşîstan", bi eşkere da xuyakirin ku armancên serhildanê di Kurdistanê de bilindtir in.

Pisa rêberiyê di serkevtinê de Bêguman weke hemû bizaveke din, şoreşa Jînayê jî bo serkevtinê, pêdivî bi rêberiyeke bihêz û yekgirtî ye ku bikare bi gotareke dewlemend şorêşê bihêztir bike. Di derheq serhildanên civakî yên modern de hatiye zanîn ku yek ji taybetmendiyên wan, şopandina siyaseta nasnameyî ye û civak hewlê ji bo bidestveanîna xwestekên xwe di qadên neteweyî, olî, civakî, çandî û...hwd de dide.

Nasnamexwaziya siyasî di rojev û xwestekên şoreşa "Jîna"yê de, da xuyakirin ku pir rengiya siyasî di Kurdistanê de hewcehî bi vexwandineke nû ye da ku gotareke yekgirtî hem di aliyê siyasî de û hem jî di aliyê neteweyî de pêşkeş bike. Di pêngeha yekemîn de, yekgirtina partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê, bi taybetî yekgirtina partiyên ku berê refên wan ji hev veqetiyabûn, pêngaveke girîng hate hilgirtin û di gotareke bihêz û yekgirtî de derketin. Bi terzekê ku hem ji aliyê rejîma Îranê ve û hem jî, ji aliyê opozîsiyona tevhîxwaz a navenda Îranê ve rastî êrîşan hatin.

Tevî vê ku hebûna sîstema dîktator û tepeserkar di Îranê de astengek mezin e di tikliyên hêzên siyasî û girpên civakî de û rê nedaye ku hêzeke opozîsiyonê ya bi bandor di Îranê de derkeve û di Kurdistanê de ji ber berdewamiya şoreşa azadîxwaziyê, rewşa civakî, çandî û hebûn û ceribandina şêwazên cur bi cur yên xebatê, rewş baştir tê nirxandin.
Lê di heman demê de ku Şoreşa Jînayê di Kurdistanê de bi astekî berfihtir û di qonaxeke hesas de derbas dibû û herwiha bi tevahî hêl û arnmancên şoreşê di Kurdistanê de li hember navenda tewahîxwaz a Îranê de kifiş kiribûn, hewce bû gotareke şorîşgêrî ya siyasî – neteweyî jî bi heman qasê berfirehtir û bihêztir derkeve rojeva şorîşê; Lê belê hêla kifşkirî ya han ji aliyê hezên siyasî yên Kurdistanê ve nehat parastin û bi hêceta berfirehtirkirin û hewildan bo damezirandina eniyeke seranserî li dijî rejîma Îslamî di Îranê, pareke mezin ji hêz û potansiyela şoreşa Kurdistanê xistine bin bandora aloziyên di navbera opzîsiyona tewahîxwaz a navenda Îranê û bê encam hêştin.


Xala lawaz li rêberiya şoreşa "Jîna"yê di Kurdistanê de, eva ye ku hêzên Kurd bi qasekî ku girîngî dane çêkirin û parastina hevsengiya digel hêzên Îranî yên sirgûnkirî, ev qas girîngî nedane hevalbendiya xwe digel hêzên Kurd yên meydana xebatê. Belgeya selimandina vê îdeayê jî mirov dikare hevpeyvîna rêkevta 21ê Rêbendana 1401an Rojî ya birêz Xalid Ezîzî, Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê digel "Kurd channel"ê bibîne. Birêz Ezîzî di koma hevpeyvîna xwe de tenê di bersiva pirsiyara dawiyê de û bi kurtî behsa pêwendiyên hêz û aliyên Kurdî dike.

Ji aliyeke dinê ve jî, bi eşkere hevalbendiya bi navê "Mehsa" ku di navbera birêz Ebdulah Muhtedî, Sekreterê Giştî yê Kemeleya Şoreşgêrên Zekemetkeş a Kurdistanê û kurê dîktatorê berê yê Îranê derket, bandoreke nerî li ser şoreşê danî.
Ji bilî wan du aliyên sereke di Kurdistanê de, hêzên din jî hene ku di nava çi hevpeymaniyeke Kurdistanî de heya niha derneketine. Lewma hewce dike ku bi vexwendineke nû û bi damezirandina eniyeke bihêz, formeke bihêztir bo serkevtina şoreşa "Jîna"yê di Kurdistanê de were darêtin.



N: Keyhan Mihemedînijad

# Yilmaz Guney û serpêhatiya wî



Yilmaz Guney ku bi şahê kirêt tê nasîn, derhêner û ekterê Kurd ku wekî wateya navê xwe netirs bû.

Dema ku basa fîlmên derhênereke Kurd tê kirin, mirov zû bîr li Yilmaz Guney dike. Çimkî wî bi fîlmên xwe hewl dida azarên Kurdan nîşanê civatgeha cîhanê bide. Hekî kesekê fîlma "Rê , Dîvar, Kerî û bav" jî nedîtibe dîsan her Yilmaz Guney nas dikin û navê wî bo me naskirî ye û ev bi pêşengê fîlmên modern li Kurdistanê tê nasîn.
Yilmaz Guney sala 1937an li gundê Yenîcê yê ser bi bajarê Adanayê ji malbatek hejar hatiye dinê; Ev Kurd bû û wî bi xwe jî di vê derheqê de wiha gotiye: "Bavê min Zaza ye û diya nin jî Kurd e û em malbatek bê zevî û hejar bûn".
Yilmaz Guney digel malbata xwe ya hejar di gund de û li jêr destê axayan karê penbûyê dikir û heta nîvê şevê mijû dibûn.
Bêguman jiyana Yilmazê piçûk jî, ji ya zarokên gund cudatir nebû; Jiyana wî di nav birçîbûn, belengazî, hejarî û karkirina nav erd û baxçan de derbas dibû. Jiyana dijwar a wî bandoreke mezin li ser bîrkirin û nerînên wî yên bo pêşerojê hiştibû. Di vê derheqa de, Yilmaz Guney wiha nivîsiye: "Tevî perîşanî, rebenî û êşa ku min di zarotiyê de dîtibû, li bîra min naçe û baş tê bîra min, me rojeke xweş û şad di mala xwe de nedîtibû, bavê min bi sedema pirsgirêkên piçûk diya min dixist û ew ji malê derdixist, gelek caran em zarok jî pêre derdixistin. Li ber deriyê mala me dareke tûyê û du darên hejîran hebûn, gelek caran em tevî diya xwe heta sibêdehê li bin wan daran de dirazan, lê car caran jî diya min destê min û birayê min digirt û em bi diya xwe re û bi pêyan nêzî 27 kîlometram rê diçûn heta ku em digihîştine mala mirovekî wê li Adanayê. Ez qet rewşa diya xwe û giriyê wê bi dirêjahiya rê ji bîr nakim! Bi taybetî, ez nikarim wan sitranên Kurdî yên dilşewat, nerim û di eynî demê de jî tijî hirs û tolhildan yên ku diya min bi rondikan re û bi dengekî nizim, di ber xwe de digotin ji bîr bikim.
Yilmaz Guney di temenê zarotiya xwe de jî, ji bo debara jiyana xwe û malbata xwe, gelek caran rojname jî difirotin û her wekî di fîlmeke xwe de ku basa serhatiyê xwe dike wiha dibêje: "Dayîk! ma nayê bîra te em çava mezin bûn, bê kinc bê kiras bê bav di nav azaran de, bi firotina Simîtan û bi firotina rojnameyan, dema ku te li deriyên malan de kincên xelkê dişûştin, ez ji dibistanê direviyam û li pey qazanckirina pariyekî nan dikevtim".
Di navbera salên 1950î de, dema ku Yilmaz Guney li Adana bû û dest bi dersxwandinê dikir, li taxeke Adanayê sînemayek hebû û carekê Yilmaz bi dana 25 Qiruş pare çû sînemayê, wê demê bi dîtina fîlmên sînemayî bo bi alîgirê sînemyê. Dilê wî hertimî li cem sînemayê bû, lê ew hê jî zarok bû û kar dikir û hevdem jî ders dixwend û perê wî têra hindê nedikir ku cardin here sînemayê.
Yilmaz bi roj ders dixwand û bi şevan jî kar dikir. Yilmaz evqas hez ji sînemayê dikir ku di dawiyê de karî karekê di sînemayê de peyda bike û li şirketa "And-Film" a sînemayê de kar bike û wî fîlimên wê sînemayê difirotin, lê perê wî kêm bû tenê 7 Lîre bû. Wî dest ji wê şirketê kêşa û çû şirketa "Kemal Film" û li wir 8 Lîre didanê, karê wî gerandina filîman û nîşandana wan li meydanên bajar û gundan de bû.
Şirketa Kemal Film ji bo Yilmaz pir giring bûn. wî ji nêzîk ve rewşa jiyana kedkar û çotiyaran, nemaze ê Kurdan didît.
Yilmaz bi vî awayî heya sala 1957an li sînemayê kar kir û zanîngeha xwe bi dawî anî û ber bi Stenbolê ve çû.
Yilmaz Guney pir hez ji nivîsînê dikir û piştî belavbûna çîrokek wî, bi tawana belavkirina bîr û bawera komonîstî, tê girtin û dixine girtîgehê û gelek jî tê îşkencekirin.
Yilmaz Guney li sala 1958an wekî ekter tê naskirn û li sala 1966an wekî derhêner hate nav dinyaya sînemayê.
Fîlmên Yilmaz Guney basa jiyan, biserhatî û bindestiya Kurdan dike. Bo mînak fîlma wî ya Hîva, biserhatiya bav, birayê wî û bigiştî ya malbata wî ye. Herwisa di fîlma xwe a bi navê "Suru" wate "Kerî" de basa jiyan dayîka xwe û xalê xwe dike.
Yilnmaz Guney di nav fîlmên xwe de basa koçberî, zilm û sitema siyasî û dûrketin ji welat dike û bi awayekî pir ciwan û hunermendane tîne ser ekranê.
Yilmaz Guney ji rêya fîlmên xwe ve jiyana rasteqîne ya gelê Kurd nîşan dide û ev jiyana ku desthilatdarên Tirkiyê dixwastin veşêrin.
Guney di tev fîlmên xwe de cureyeke dinyabînî bi kar dianî ku ev jî rûyê Marksîstiyane bû ku di tev berhemên wî de reng dide û xuya ye.
Hunera Yilmaz Guney pêwendiyeke rastevxwe digel civatgehê hebû, û her lewma ji aliyê civatgehê ve pêşwazî jê dihatekirin.
Dema ku kesekê bîr û baweriyeke siyasî neba û temaşayê fîlmên Yilmaz Guney dikir, bi bê xwasta xwe, dîtingeheke siyasî peyda dikir.
Fîlmên Yilmaz Guney evqas li ser civatgehê û bînerên wî bandordar bû û heta dikarin dîtingeha xelkê bo derdorên xwe, jiyan û civatgehê biguherin.
Fîlma "Yol" wate Rê ku sala 1982an hate berhemanîn, yek ji berhemên herî naskirî yên Yilmaz Guney e û yek ji tirajîdatirîn fîlm e ku heta niha hatiye berhemanîn.
Di wê fîlmê de ti hêviyek nayê dîtin û di destpêka wê fîlmê de dîmenê girtîgehekê tê nîşandan. Di vê girtîgehê de tirs, serkut û tepeserî nîşan dide û di nav wê fîlmê de çawa bêrêzî ji girtiyan tê kirin û çawa bi berdewamî gef ji girtiyan dixwin, nîşan dide.
Fîlma "Rê" ku baştirîn fîlma Yilmaz Guney ye, bi yek ji siyasîtirîn fîlmên dîroka sînemaya Tirkiyê tê zanîn û di sala 1982an de xelata festîvala "KEN"ê pê hate bexşîn
Yilmaz Guney di newroza sala 1984an li Feransayê ku beşdar bû li derheq Kurd û Kurdistana serbixwe wiha got: "Hevalno, êş, zordarî, hejarî, xwîn û rondik çarenivîsa gelê kurd nîne. Em wê çarenivîsê red dikin, em wê çarenivîsê nas nakin. Em naxwazin zarokên welatek bindest bin ku ji çar aliyan ve hatiye dagîrkirin, belkî em dixwazin bibin bi zarokên dewlete serbixwe û yekgirtî û serbestiya Kurdistanê, em bibin bi zarokên Kurdistanê. Em dixwzin li ser axa xwe bi zimanê xwe stranên evînî û azadî bêjin. Em dixwzin cîhana xwe û axa xwe bi destê xwe tevlî hev bikin û ji nû ve ava bikin. Em dixwazin li ser axa xwe û bin alaya xwe serbixwe û azad bijîn".
Yilmaz Guney ku di welatê Feransayê de dijiya û ji ber neçariyê welat bi cih hêlabû, di encamê de roja 9ê Îlona 1984an li temenê 47 salî bi sedema nesaxiya şêrpence li nexweşxaneya Parîsê malavayî ji jiyanê kir û termê wî bi amadebûna sedan heval, derhêner, alîgir û hezkiriyên wî, di nav goristana Pêrlaşiza Parîsê de ew bi axê spartin.
Dema ku Yilmaz Guney koça dawiyê kir, wê demê li ser manşêta gelek rojnameyan hate nivîsîn: (Fîlm Mir).

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Di Tebaxa 2023an de 264 hevwelatî ji aliyê hêzên rejîma Îslamî ya Îranê ve hatine girtin

Di meha Tebaxa 2023an de, herî kêm 264 hevwelatî ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatine girtin û ev amare li gorî meha Tîrmehê ku 225 hevwelatî hatibûne girtin, 39 kes wate 17% zêde bûye.

Li gorî amara ku ji aliyê Rêkxirawa Mafî Mirovî ya Hengawê ve hatiye tomarkirin, Di meha Tebaxa 2023an de, herî kêm 264 hevwelatî ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve hatine girtin, ku aliyê kêm 116 kes ji wan welatiyên Kurd in, 23 hevwelatiyên Gîlek, 14 hevwelatiyên Belûç û herwisa 36 jin, 11 zarok û 17 hevwelatiyên Behayî ne ku di meha Tebaxa 2023an de hatine girtin.

DI nava vê amarê de hatiye zanîn ku 116 kes wate %44 ji gelempera vê amarê welatiyên Kurd in ku ji aliyê hêzên serkutkar ên rejîmê ve hatine girtin ku ev amare tenê li Kurdistanê pêka Tîrmeha 2023an, bi rêjeya %16 zêde kiriye.

Li gor amarên tomarkirî û belgeyên Rêxistina Mafê Mirovî ya Hengawê, di heyama meha borî de, herî kêm 36 jin ji aliyê navendên ewlehî yên rejîmê ve li seranserî Îranê hatine binçavkirin, ku ev yeka dike 13.6% ji tevahiya girtiyan.

Hêjayî gotinê ye ku di mehên borî de, herî kêm 15 jinên çalakvanên Kurd û 11 jinên çalakvanên Behayî ji aliyê saziyên rejîma Îranê ve hatibûne girtin.

## Di meha Tebaxa 2023an de zêdetirî 74 girtiyan di girtîgehên rejîmê de hatine bidarvekirin

Di mehekê de herî kêm 74 girtî di girtîgehên rejîma Îranê de hatine darvekirin. Ev rêjeye li gorî Tîrmeha sala 2023an bi rêjeya 13 haletan wate (21%) zêde kiriye. Di Tîrmehê de 61 kes di girtîgehên rejîmê de hatibûne bidarvekirin.

Li gorî amara ku Ajansa Nûçegihaniya "Hengaw"ê tomar kiriye, di meha Tebaxa 2023an de, herî kêm 74 kes di girtîgehên rejîma Îranê de hatine bidarvekirin ku ji vê amarê 53 kes bi sizayên madên hişber hatine îdamkirin.

Hengaw dibêje, li meha Tebaxê di girtîgehên rejîma Îranê de 16 girtiyên Belûç, 10 Kurd û 8 girtiyên Tirk hatine bidarvekirin. Di vê mehê de 3 girtiyên Efxanî, zarokek bi navê Mihemed Cewad Ekberî yê xelkê Koyeştê û jineke bi navê Ruqiye Abidînî ya xelka Tewrêzê, hatine îdamkirin.

Ew kesên ku hatinî bidarvekirin bi wan tohmetan bi îdamê hatibûne sizadan: "Kuştina bi qestî, 15 kes; bazirgaznîkirin bi madeyên hişber, 53 kes; destdirêjiya sêksî, 5 halet û diziya çekdarî jî haletek bûye.

## 38 kedkarên Kurd ên kompaniya neft û gaza Bankolê li ser karê xwe hatine derxistin

38 kedkarên Kurd ên kompaniya neft û gaza Bankolê li ser karê xwe hatine derxistin

Li gorî rapora ku Ajansa Nûçegihaniya "Hengaw"ê belav kiriye, di heyama borî de 38 kedkarên Kurd û xelkê bajarê Eyvan ê ser bi parêzgeha Îlamê ku li pirojeya neft û gaza Bankola vî bajarî de kar dikirin, bi sedema daxwaziyên xwe û nedana mûçeyên meha Xermananê li ser karên xwe di vê kompaniyayê de hatine derxistin.

Li gorî belgeyên Hengawê, xwedîkar û kargêrê kompaniya neft û gaza Bankolê li bajarê Eyvanê, bilî biryara derkirina wan kedkarên damezraweyî, sikalaya yasayî jî li ser wan tomar kiriye;

Hêjayê gotinê ye ku wan kedkaran bi mebesta nîşandana nerizatiya xwe li derheq guhnedana berpirsên vê kompaniyê bi daxwazkariyên wan ên hatinî ragirtin, li meha Xermananê girev girtibûn.

Ev pirojeye radestî Spaha Pasdaran hatiye kirin û vê rêkxirawa terorîstî û serkutkar a rejîmê jî, mohreyên xwe li vê kompaniyayê li cihê kedkaran damezrandiye.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdiśtanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (453)

